## Qebarê şikestina Kurdî

»»» R:8



## Remza şoreşê û destkevtên 110 Rojan de

»»» R:3

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*
*www.agirimedia.org Hejmar (437) 05-01-2023Buha (1000) Tûmen*

## Di Derbarê ola Zerdeştiyê de ku oleke kevin ya Kurdan e; bi çend zanîn...

»»» R:5

## Şoreşa Jina, ronesansek e li dijî çespandina hêz û serweriyê

»»» R:7



# Qetlîama Li Parîsê Rûda û Helwesta Kurdan



N: Mustafa Ozçelîk
Serokê Giştî yê PAKê

Roja 23yê Çileya Pêşîn a 2022yê, kesekî Fransiz ku temenê wî 69 sal e, li Parîs a paytexta Fransayê bi çek êrîşî Navenda Çanda Kurd a Ahmet Kaya û sertraşxaneyekê kir û di encamê de 3 Kurd hatin kuştin û 3 kes jî birîndar bûn.

Piştî vê êrîşê, gelek çalakî û xwepêşandanên cûr bi cûr hatin li dar xistin. Lê ya herî balkêş ew bû ku, hinek Kurdên têkder, xerabker, vandal, li Parîsê bi navê nerazîbûnê êrîş birin ser dukan û cîh û war û otomobîlên xelkê û park û baxçeyan û gelek der şewitandin.

Ew kesê Fransiz yê ku êrîşî kurdan kiribû, xwe wek kesekî nîjadperest pênase kirîye, wek psîkolojîk kesekî nexweşbûye û berê jî ji ber kiryarên nîjadperestî cezaya hefsê xwarîye, hatîye girtin.

Herçiqas ev kiryara wek kiryareke takekesî hatibe nîşandan jî, tecrubeyên heta îro nîşan dane ku, di kiryar û êrîşên bi vî rengî da destên hinek dezgehên îstîxbaratê û hêzên tarî her hene.

Cîhê mixabinîyê ye ku, yên di wê êrîşê da hatîne qetil kirin û birîndar bûne, yên mexdûr jî kurd in; yên ku di encama wan êrîşên bi navê kurdan li cîh û war û otomobîlên xelkê Fransayê hatîye kirin da, wek prestîj zerar dîtine jî her kurd in.

Wan kesên ku bi navê kurdan ew êrîşên terorî, nemirovî , xerabker birine ser cîh û otomobîlên xelkê Fransayê, bi kîjan armancê û li ser navê kîjan partîyê, rêxistinê û dezgehê ew kiribin jî, di encamê da ji dijmin û xêrnexwazên miletê kurd ra xizmet kirine.

Ev êrîşa li Parîsê li kurdan hatîye kirin û êrîşên terorî yên hinek kesan li ser navê kurdan li cîh û war û otomobîlên xelkê Parîsê kirine, di demeke weha da rûdaye ku, Dewleta Fransayê di derbarê kurdan da sîyaset û helwesteke erînî dimeşîne û di raya giştî ya Ewropayê da di derbarê kurdan da piştgirî û sempatîyek berfireh çêbûye . Ev jî cîhê balê ye. Di encama herdu kiryaran da yên zerar dîtîne Dewleta Fransayê û gelê kurd e. Ev encama jî nîşana wê yekê ye ku, yên êrîş birine ser kurdan û yên li ser navê kurdan êrîşên têkder, terorî kirine ji yek armancê, ji dijminên Fransayê û ji dijminên kurdan ra xizmet kirine. Ma gelo ev dikare tesadufek be? Mixabin, qaîdeyên zanistê û tecrubeyên heyî, ji me ra nabêjin ev kiryarna tesaduf in.

Helbete ku em bangî rêzdar Macron dikin da ku di demeke kurt da sebebê vê êrîşê û yên li pişt vê êrîşê ne bêne dîyar kirin û êrîşkar jî bê ceza kirin. Lê divê em bibînin ku, piştî vê êrîşa li Parîsê li kurdan hate kirin, Serokê Fransayê Rêzdar Emmanuel Macron di derbarê vê êrîşa çekdarî da hevxemîya xwe dîyar kirîye û gotîye kurd bûne armanc. Ev helwesteke erênî ye. Herweha Seroka Beledîyeya Parîsê seredana cîhê bûyerê kir. Beledîyeya ku bûyer lê rûdaye Alaya Kurdistanê hilda û wek tazîye û rêzgirtinê Alaya Fransayê li wê belediyeyê nifs kirin.

Divê em alîyên erênî û neyênî yên Ewropîyan bi hev ra binirxînin

Piştî kesên ku bi navê kurdan ew êrîşên terorî, xerabker birin ser cîh û otomobîlên xelkê Fransayê, hinek sîyasetmedar û rewşenbîrên kurdan, piştgirîya van kiryarên terorî kirin û gotin ‘’Ev kiryarna, li dijî durûtîya Fransayê û Ewropîyan kiryarên meşrû ne, berteka însanî ya hinek ciwanên kurdan e’’.

Helbete gava em Fransayê û Ewropîyan dinirxînin, nabe ku em bes bi yek alî binirxînin û şîroveyan bikin; divê em bi alîyên wan ên erênî û neyênî nirxandineke du alî bikin.

Gava ku em behsa hinek helwest û sîyaset û kiryarên erênî yên Fransayê û yên Ewropîyan dikin, divê em helwest û sîyaset û kiryarên wan ên di dîrokê da jî jibîr nekin.

Em baş dizanin ku ji destpêka sedesala 19ê heta destpêka sedsala 20ê, li gel Dewleta Osmanî û Îranê, dewletên wek Fransa, Brîtanya, Rûsya, Almanyayê jî di rêlibergirtina dewletbûna Kurdan da bûne aktorên esasî. Herweha em baş dizanin ku Fransa û Brîtanya bi Peymana Lozanê aktorên sereke ne ku Kurdistan kirine çar perçeyan.

Em baş dizanin ku Emerîka, Netewên Yekbûyî, Yekitîya Ewropayê ji roja îmze kirina Peymana Lozanê heta destpêka salên 1990î, hema hema tu carî piştgirîya kurdan nekirine, gelek caran rê li ber kurdan girtine, piştgirîya dewletên dagirkerên Kurdistanê kirine.

Di van salên dawî da jî, di kuştina herdu Serokên PDK Îranê, şehîdên Kurdistanê Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî da, di kuştina jina kurd Sakîne Cansiz û herdu hevalên wê yên jin ên Kurd da, dewletên Awûstûrya, Almanya û Fransayê mixabin lêkolîn û lêpirsîneke ewlehî, hiqûqî û dîplomatîk ya pêwîst nekirine; an ev êrîşna û qesasên wan nedarizandin, an jî bi helwesteke gelekî sist çûne ser van êrîşan.

Ji alîyekî din ve jî, bi taybetî ji sala 1991ê ve heta îro, di derbarê kurdan da, li gel hinek helwest û sîyasetên Emerîkayê yên neyênî jî, em şahidê piştgirî, helwest û sîyasteke erênî ya Emerîkayê û Fransayê ne jî.

Helbete ku yê şikil dide sîyaset û helwestên dewletan, berjewendîyên wan ên dewletî ne. Di van 30 salên dawî da, car caran berjewendî û sîyasetên hinek dewletan, rê ji bidestxistina mafên neteweyî, niştimanî yên miletê kurd ra jî vekirîye. Nimûneya vê yekê ya herî berbiçav jî, helwest û sîyaseta Emerîka û Fransayê ya di derbarê Sedam Huseyîn û rûxandina Rejîma Beasê ya li Iraqê ye. Di sala 1991ê da bi pêşkêşîya Fransa û Emerîkayê, ji alîyê hêzên hevpeymanîya navdewletî ve, li ser beşeke asîmanên Başûrê Kurdistanê biryara qedexeya firîna balafiran hat girtin. Vê biryarê bingeha rizgar kirina Hewlêrê, Silêmanîyê û Dihokê û bingeha Herêma Federe ya Başûrê Kurdistanê ava kir.

Bi taybetî Fransa û herweha Emerîka( ji xeynî helwesta wê ya li dijî referandûma serxwebûnê û çavlêgirtina wê ya di 16ê cotmeha 2017ê da dagir kirina Kerkûkê û navçeyên ku mijara madeya 140î ne), li Başûr Kurdistanê ji bo piştgirîya kurdan, ji bo yekgirtina hêzên pêşmerge, sîyaset, alîkarî û helwesteke erênî dimeşînin. Herweha di destkeftinên ku îro li Rojavayê Kurdistanê da hene û di hewlên ava kirina tifaqa Kurdî-Kurdî ya li Rojavayê Kurdistanê da roleke gelekî girîng ya Fransayê û Emerîkayê heye.

Fransa û Emerîka li Başûr û Rojavayê Kurdistanê di şerê kurdan ê li dijî DAIŞê da jî piştgirê kurdan bû.

Fransayê li himberî Referandûma Serxwebûnê ya li Başûrê Kurdistanê helwesteke neyênî nîşan neda.

»»»Dom R:3

»»»Doma R:2

Fransa li himberî sîyaseta Tirkîyeyê ya li dijî Rojavayê Kurdistanê jî, piştgirîya kurdan dike.

Tirkîye ji helwest û sîyaseta Fransayê ya piştgirîya kurdan dike gelekî aciz e.

Divê em li cîhanê dijminên xwe kêm, dostên xwe zêde bikin
Piştî kuştina keça kurd Jîna Emînî, raperîna gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê û gelên Îranê, di qada navnetewî da û di raya giştî ya gelên Ewropayê û gelên din ên cîhanê da ji bo kurdan piştgirî û sempatîyeke mezin bi xwe ra anî. Bi taybetî li Fransayê jî ev piştgirî gelekî baş bû.

Gava ku em vê sîyaseta Fransayê ya ji bo piştgirîya kurdan ya van salên dawî didin ber çavan, meriv baş têdigihîje ku Tirkîye, Îran, Sûrîye çima ewqas ji Fransayê aciz in. Û meriv baştir têdigihîje ku, wan êrîşên terorî, xerabker yên hinek kurdan birin ser cîh û otomobîlên xelkê Fransayê, çiqasî di berjewendîyên Tirkîye, Îran û Sûrîyeyê da ne, çiqas zerarê dide kurdan.

Mixabin, gava ku meriv encamên wan êrîşên xerabker û terorî dide ber çavan, ne mimkune ku meriv van êrîşan bes wek êrîşên çend ciwanên ku bi hîsîyat tevgerîyane, wek bertekeka çend kesên ji Fransayê acizin pênase bike. Aşkereye ku destên hinek îstîxbarat, dewlet, hêzên tarî, organîzyon û dijminên kurdan tê da heye.

Di demeke ku rûdanên li her çar perçeyên Kurdistanê bi xweşî û nexweşîyên xwe ve tesîrê li hevdu dikin da, divê hemû kurdên cîhanê di her helwest, gotin û sîyasetên xwe da bi berpirsyarî tevbigerin, rê ji xerabîyên xêrnexwazan ra xweş nekin. Divê hemû kurd ji hevdu ra bibin alîkar, piştgir.

Herweha divê hemû kurdên cîhanê dest bidin hevdu da ku li cîhanê dostên xwe zêde, dijminên xwe kêm bikin. Divê em rê nedinê ku hinek kes li ser navê kurdan, bi provokasyon û sîyasetên xerabker, wan şaxên darê yên ku di bin lingên kurdan da ne bibirin.

Yekgirtina kurdan her zerûrî ye; lê piştgirîya dewletên mezin û ya gelên cîhanê jî bi qasî wê girîng e.

Mustafa Ozçelîk
Serokê Giştî yê PAKê

# Remza şoreşê û destkevtên 110 Rojan de



N:Nûredîn Sofîzade


Vê carê şoreke cuda ji carên pêşda, bi şiklê cuda, diruşmên cuda, armaceke cuda, ev nêzî 4 mehane ku li Îranê de bi dijî dîktatoriya rejîma Îslamî destpêkiriye û keya niha jî bi awayê cur bi cur dom dike.
Vê şoreşê li Rojhilatê Kurdistanê destpêkir, ev jî xwedî derkevtina gelê Kurd ji kerameta keça Kurd a bi navê Jîna Emînî xelka bajarê Seqizê bû ku li Tehrana peytextê Îranê kevte ber êrîş û lêdana hêzên cinayetkar yên rejîma dijî mirov ku vê keça Kurd bi vê sedemê canê xwe ji dest da.
Lêreda naxwazim basê bûyerên di vê heyamê de bikim, belkî dixwazim cudahiya vê şoreşê û xalên serkevtinê yên vê bikim.
Di destpêka vê şoreşê de heya niha gelek destkevtên girîng hebûne ku ev jî nîşana serkevtina bi ser dîktatoriyê ye, wirda dixwazim amaje bi çend xalên girîng ji wan serkevtinan bikim.

1- Yekitiya di astê seranseriya Îranê de çêbûyî ku di heyamê deshilata reş a wê rejîmê de bê mînak bû.

2- Pêşengiya Jinan li her qad û çalakiyeke wê şoreşê da, ku ev jî bê mînak bû, dengê pêşengiya jinan di vê şoreşê de bona rizgarî ji destê dîktatoriyê û bidest ve anîna mafê xwe û li ser xwe wêde birina sitema sîstematîka çend qat li astê dûnyayê de deng veda û karî bala hemî xebatkar û parêzer û bervankarên mafê jinan û deshilatdarên zaf welatan û sazî yên navnetewî bo aliyê xwe rakêşe.

3- Yekitî û hevdengiya hemî netewên pêkhînerên Îranê, ku heya niha bêmînak bû û rejîmê di heyamê derbas bûyî de karîbû bi sedema nebûna hevahengî û yekrêziya di navbera wan netewan de, dirêjiyê bide bi dîktatoriya xwe û bo vê armancê jî rêjîmê hertim cehda çêkirina kêşe û tevdaniya di navbera netewan dida.

4- Yekitiya di navbera hemî Ol û ayînên cuda ye di nava Îranê de, bi hemî cudahiyên baweriya xwe, lê, vê carê hemî xelkê girêdayî bi heçî baver û olekê, karîn vê çeka cudahiya olan ji dest rejîma dîktator bistînin ku ev 44 sale bi dijî hemî xelkê welat bikar tîne.



5- Yekitî û hevdengiya di navbera hemî qat û texên cuda cudaye di Îranê de, wek bazarî, bajarî, gundî, esnaf, kirêkar, xwendikar, mamostayên olî û mamostayên zankoyan, perestar, hunermend, sînemakar, werzişvan û ... hwd ku di heyamê deshilata reş a vê rejîmê de bê mînak bûye.

6- Yekitî û yêkdengiya di navbera şoreşa navxwe û hemî çalakên Îranî û opozîsyonê li derveyî welat ku bê guman çalakiyên derve yên Îraniyan û girse û xwenîşandanên wan kariye bala civatgeha navneteweyî zêdetir bo aliyê wê şoreşê ve rabikişe.

7- Piştevaniya welat û deshilatdarên zaf welatan ji vê şoreşa vê carê ye Îranê bi dijî dîktatoriya rejîma îslamî ku li dîrokê de bêmînak bûye û bitaybetî li heyamê deshilata vê rejîmê de bê mînak bûye.

8- Hevdem digel vê şoreşê netifaqî û xwe cuda kirina pareke berçav ji deshilatdarên rejîmê ji deshilata dîktator û heta li asta malbata Elî Xameneyî yê dîktator bixwe û kevtina digel pêvajoya şoreşê.

Belê ev xalên serwe û renge gelek mijar û xalên din jî hebin, hemî ev mînakan in ku em dikarin pê piştrast bin ku ev şoreşa zû yan direng dê serkev.
Renge hevdem digel wan xalên erênî, hinek xalên nerênî jî xuya bin, lê, bêguman îrada serkevtin û berxwedanê zêdetire û hemî nîşana eyana serkevtina vê şoreşê ne û serixûniya dîktatoriyê gelek nêzîke.

**Abdula Hicab: ““Danîna dorpêçan ji aliyê welatên xwedî hêjimonî di asta navneteweyî de bo ser dewletek, aliyek an organek fermî nîşaneya hindê ye ku ew alî di asta navneteweyî de meşrûiyeta xwe ji dest da ye”.**



Abdula Hicab
Çalakvanê Siyasî

**Me digel Abdula Hicab çalakvanê siyasî li derheq tehrîmkirina Spaha Pasdaran ji aliyê welatên Ewropî û Amerîkayê ve hevpeyvîn pêk anî navbirî got: “Danîna dorpêçan ji aliyê welatên xwedî hêjimonî di asta navneteweyî de bo ser dewletek, aliyek an organek fermî nîşaneya hindê ye ku ew alî di asta navneteweyî de meşrûiyeta xwe ji dest da ye”**

**P: Rêzdar Ebduk Hicab, Komara Îslamî serdarê Spaha Pasdaran yê bi navê Mihemed Keremî wekî parêzgarê Sîstan û Belûçistanê dest nîşan kir, bi nerîna we çima kesekî asayî dest nîşan nekir bo vê posta parêzgehê?**

**B**: Ev vedigere ser siyaseta giştî ya rêjîmê ku piraniya pile û payeyên deselatê dane destê fermande û berpirsên pilebilind yên Sipaha Pasdaran. Tenê di dema Reîsî de, ez bawer im ew kesê 14-15ê ye ku ji berpirsayetiya Sipahê re derbasî pileya Parêzgariyê dibe. Elî Riza Fexarî parêzgarê Tehranê, Zeynil Abidîn Rezewî Xurem Parizgarê Azerbaycana Rojhilat, Ye`iqûb Elî Nezerî parêzgarê Xurasan a Rezewî û gelek fermandeyên din yên sipahê di dema Reîsî de bûne parêzgar. Parêzgarên din jî hema bi giştî an ji Sipahê tên, an ji beşên istixbaratî û ewlekariyê.

Lîsteya parêzgarên her çar parêzgehên Rojhilatê Kurdistanê dîmenek baştir nîşanî me nade. Temaşa bikin: Muhemed Sadiq Muitemidiyan parêzgarê Urmiyê ji ku tê? Ji beşa sîxurî, an îtilaata Sipahê Pasdaran. Di gel ku ew bi xwe Kurd û ji Kirmaşanê ye, lê, ji roja ku xwe nas kirî heya îro tenê di dem û dezgehên ewlekarî, parastin û dayireyên girêdayî bi beşa ewlekariyê ya rêjîmê re kar kiriye. Parêzgarê Sine Ismaîl Zariyî Kûşa ji karûbarên birêveberiya Koma diyarîkirina berjewendiyên rêjîmê (Mecmeê teşxîsê meslehetê nizam) tê. Yek ji moreyên rêjîmê ye ku ji gencitiya xwe ve di dem û dezgehên ewlekarî û istixbaratî de kar kiriye. Wî di serhildana dawî de ku bi Şoreşa Jîna tê nas kirin rolek pir xirab lîst û bi awayê raste-rast kete xizmeta dezgehên ewlekariya rêjîmê ji bo kuştin û serkutkirina xwepîşanderan. Ji ber hindê di wê dema dawî de ji aliyê Ingilistanê ve kete nava lîsteya Dorpêçan.

Parêzgarê Kirimaşanê, Muhemed Teyib Sehrayî pêştir berpirsê amade kirin û şandina kesên ku ji bo rêjîmê propagendeyê dikin (Defterê êizamê Mubelix) bû. Ew tê çi wateyê? Tê wateya ku ji bo pêşvebirian îdeolojî û siyaseta rêjîmê bi her awayî kar kiriye. Anî ji Sipahê pitir pasdar e. Rewşa parêzgeha Îlamê ne baştir e. Hesen Behram Niya, ji karê cîgirê siyasî- ewlekarî yê Parêzgahê tê û pêştir endamê Sipaha Pasdaran bûye.

Ew yek nîşan dide ku ji bo sipahê erka parêzgar berpirsayetiyek girîng e ku naxwaze bide destê kesên ku ji derweyî heleqeya Sipahê tên. Xuya ye ku di asta parêgehan de parêzgar xwedî deselata herî bilind a ewlekarî, asayiş, pilansazî, birêveberî û ... hwd e. Ew tê wateya hindê ku Parêzgar bi xwe fermandeyek leşkerî ye, û hêza leşkerî ya rêjîmê jî di destê Sipahê Pasdaran de ye.

Rewşa Belûçistanê di warê ewlekarî de ne ji ya Kurdistanê baştir e. Dijminatiya rêjîmê bi netewa Belûç re jî weke dijminkariya bi netewa Kurd re vedigere bo salên




destpêka hatina ser kar ya wê rêjîmê. Lewma diyarîkirina fermandeyek Sipaha Pasdaran weke parêzgar li wê deverê ne tiştek ecêb e.

Birêveberên dem û dezgehên din yên birêveberiyê jî an di destê sipahê de ne, an bi îzn û li gor pilanên sipahê têne diyar kirin. Lîsteya fermandeyên sipahê ku bûne wezîr, balyoz, şandeyen fermî û nefermî û hwd dûr û dirêje.

**P: Gelo tehrîmkirina berpirsên leşkerî yên navendên cuda yên Spaha Pasdaran û saziyên din yên leşkerî yên Komara Îslamî ji aliyê welatên Ewropî û Amerîkayê ve çi bandorek li ser rewşa Îranê li derve û hûndir dadinê?**

**B:** Danîna dorpêçan ji aliyê welatên xwedî hêjimonî di asta navneteweyî de bo ser dewletek, aliyek an organek fermî nîşaneya hindê ye ku ew alî di asta navneteweyî de meşrûiyeta xwe ji dest da ye û ketiye nava lîsteya reş. Ew yek girîng e. Di piratîkê de jî dikare bandora xwe hebe, ji ber ku piraniya berpirsên payebilinde rêjîmê li derveyî welat, li welatên weke Kanada, Ingilistan, Alman, Îtaliya, Feranse û heta Amerîka diraf û berjewendî hene. Hin karbidestên asta bilind hatinûçûna wan welatan dikin, kargeh û firmayên wan hene û bi şirketên wan welatan re bazirganiyê dikin. Heke dorpêç cidî bin, dikare bandora xwe danê.

Di wan salên dawîn de, bi hemû propagenda û diruşmên rêjîmê re, lê, moreyên xwedî berpirsayetî di Sipahê de bi welatên rojavayî re her demê di nava danûstandinan de bûne. Miliyarderên weke Babek Zencanî, Sadiq Mehsûlî, Muhemed Seraf û bi dehan ên din bi rêya sipahê û bi şirîkatiya sipahê ew mal û heyî bi dest xwe ve anîn. Zêdeyî 60% ticaret û abûriya Îranê raste rast di dest sipahê de ye. Kargehên bingehîn û pîşesaziya herî xwedî bandor li Îranê di destê Sipahê de ne. Lewma, dorpêç bê bandor nabin, lê bi tena serê xwe nikarin rêjîmê ji kar bixin.

**P: Rêzdar Ebduk eger tehrîmkirina sazî û berpirsên Saziya Spaha Pasdaran ji aliyê welatên Ewropî û Amerîkayê ve, bersiv neda ev welatane dikarin esmanê Îranê bo firînê daxin û daxistina esmanê firînê çi bandorek heye li ser wî welatî?**

**B**: Ev mijarek cuda ye. Esmanê welatekê heta di dema şer de jî nayê qedexe kirin, lewma nêrînek wisa ntenê dikare hêvî û xeyalek şirîn be. Divê em xwe bi tiştê ku ber bi aqilane ye û mumkîne re elaqedar bikin. Lê, tenê weke girîmaneyek eger bê û rewşa ewlehyyî biguhere, weke mînak aloziyên di navbera Îsraîl û Komara Îslamî de bigîje asta teqînê û di encama şerek îhtimalî de es-

»»»Dom R:5

»»»Doma R:4

manê Îranê ji balafiran re bê sînûrdar kirin, wê demê rêjîm nikare xwe li ser pêyan bigre. Weke min bas kir, ew yek ne di rojeva cîhanê de ye.

**P: Rêzdar Ebduk Hicab bi nerîna we Komara Îslamî dibe bi tehrîman bê guhertin an jî biherife?**

**B**: Heya roja Îro çi rêjîmek tenê bi rêya dorpêçên abûrî nehatiye guherîn. Lê, di pirsên siyasî de tiştek mutleq nîne, bi wê wateyê ku tu nikarî sedîsed bibêjî ku dorpêçên şidyayî nikarin rêjîmê hilweşînin. Pirs ewe ku gelo ma ew bi tena serê xwe dikare weke yek ji faktorên hilweşandinê be? Bersiv "na" ye.

Dorpêç dikare rewşa jiyana xelkê hêj aloztir û nexweştir bike, belengazî, birsîbûn û xêzaniyê di civakê de belav bike û bi xwe re bi dehan pirsgirêkên din bîne. Di encama rewşek wisan de, ne dûre ku gel bi berfirehî serî hilde û weke tê gotin «li ser rihê xwe re bawêje».

Di rewşek wisan de ne dûr e ku beşek ji parêzvanên rêjîmê jî berjewendiyên xwe di parastina sîstemê de nebînin û berê xwe ji rêjîmê bizivirînin. Tenê di rewşek wisan de ye ku zemîne ji bo çûna rêjîmê xweş dibe.

**P: Dawîn pir rêzdar Ebduk Hicab dema ku tehrîm û daxistina esmanê firînê li ser welatên dîktator de bersiv neda, mezin hêzên cîhanê dikarin bijardeya êrîşa leşkerî hilbijêrin?**

**B**: Rewşa cîhanê di sala 2022`an de bi qazanca dîktatoran hate guherîn, mixabin. Cemserbendiyên nû ku bi şerê Ukraina re gihîşte şerê rû bi rû, bû heger ku rêjîmên dîktator hêj zêdetir pişta hevûdu bigrin. Çîn weke cemserek nû ya abûrî û leşkerî wê zêdetir destê xwe dawêje siyaseta cîhanî û dixwaze bibe parsengek nû.

Ji bo Çînê pirsên weke mafê mirovan, demokrasî û wekhevî ne pîvan e. Rûsiye ketiye nava çembera hêzên xwedî bandor û xwe di nava alingariyek cidî de dibîne. Koreya Bakûr bûye alingariyek cidî ya Etomî.
Di qeyranek hê zêdetir de ew rêjîm wê destê hevûdu bigirin.

Di asta navçeyê de Tirkiye wê bi rêjîma Esed re ku dost û bermayîxwarê rêjîma Komara Îsmaliye ketiye nava diyalogê û ber bi asayîkirina pêwendiyan ve diçe. Ji welatên derdora Kendavê bi der, Êraq, Pakistan û Tirkiye wê heta dawî li hember destverdanek derveyî li dijî rêjîma Komara Îslamî bin. Ji hindê jî bi der, Amerîka ne amade ye di rewşa niha de xwe bixe nava şerek nû de ku encam jê re ne diyar e.

Di vê navê de tenê Îsraîl e ku ewlekariya xwe di nebûna rêjîma Komara Îslamî de dibîne. Ew jî divê gelek hûr û gir bike heya xwe bixe nava alingariya şerek raste rast bi rêjîma komara Îslamî re. Lê eger rewşek wisan hate pêş Amerîka wê bi hemû şiyana xwe Îsraîlê biparêze.

Li ser wê bingehê divê piranî li ser potansiyelên navxwe ji bo guherandina rêjîmê bê hisab kirin.

# Di Derbarê ola Zerdeştiyê de ku oleke kevin ya Kurdan e; bi çend zanîn...

**N: Agirî Botan**

Di ola Zerdeştiyê de her û her şîretên bona parastin û paqişîkirina xwezayê ya li cîhanê tê kirin.Her weha diyalekta xwezayê di her warî de bi hûrbinî tê ravekirin.

Bawermendên vê olê her roj sê caran ji bo afirandina cîhan û hemû qenciyên xwezayê destên xwe ber bi rojê ve bilind dikin bi şêweya perestî lawayên şêkirandina qenciyan ji afirêderê nemir,baş,pak û mezin Ahûra Mezda re dikin.

Jê pê ve tê de her û her afirandin û taybetiyên wê, wekhevbûna her hebûn û zindiyan-ku xweza di hundurê xwe de cur bi cur hebûn û zindiyan dihewîne-tê behs kirin.Ji bo berdewamiya vê jiyanê ya di vê jîngeha hevpar de gelek caran hişyariyên xwezaparastinê li mirovan tê kirin.

Di van jêgiran de ji bo berdewamiya jiyana zindiyan giringîya parastinê ya xwezayê ku warê zindiyan e eşkere tê dîyar kirin.

"Li gorî baweriyê jiyîn ne tenê ji bo ajal û mirovan e.

Di heman demê de her hebûnên xwezayê wekî zindiyan nebin û nelivin jî di nav vê jiyînê de perçeyên wê ne,hebûna wan bi hev re girêdayî ye.Ji ber wê her keliyê bandoreka mezin û domdar li ser hev dikin."

Bi sedema vê bandorê temamî hebûnên xwezayê zindî têne qebûl kirin;wek ronahî,riwek û giya,giyanewer,cure ajal,însan...

Ev hemû zindî berhemên Xwedayê mezin ji Ahûra Mezda ne.

Divê wek sûretên Ahûra Mezda bêne dîtin û ji wan re rêz bê girtin.

Mixabin roja îroyîn hişmendiya xwezaparastinê hêj li seranserê cîhanê berbelaw nebûye.

Hêj her dewlet her însan li ser vê mijarê ya û li ser xwezayê jiyaneka hevpar li hev ne kirine.

Hêj kêşeyên ji encama xerabkirina xwezayê çareser nekirine û hêj rê li ber xerabkirina wê nehatiye girtin. Hêj nikarin ji bo parastina wê biryareka hevpar bidin û niqaş tê kirin.

Lê belê kêm û kêm çar hezar sal berê an nêzî çar salan ev bîr, hişmendî di nav kurdan û aryayiyan de belav bûye û bûye bingeha jiyana rojan e.

Hemû zindî wekhev,wekî hev hatine dîtin.

Bona berdewamiya wê û dayinîn wê di cîhanê de tenê û tenê jiyaneka hevpar hatiye pejirandin û jiyîn.Divê ji îro şûn de jî bawerî li ser vê hişmendiyê bê ava kirin û xweza bê parastin tim û tim paqij bê hiştin.

Ji bilî van şîret û hişyariyan di Avestayê de çar hêmanên jiyanê yên bingehîn jî derbas dibin.

Ew hêman;gewher av,agir,ax,hewa ne.Bi gelek salan şûn de Demokrîtosê yûnanî jî girîngiyan wan derxistiye li pêş cîhanê.Ew sifetên Xwedayê mezin ji aliyê yêzdanên çavdêr ve têne parastin.Anahîta yek ji wan yezdanan e û yezdê avê ye.Ew jî wekî yên din aferideya Ahûra Mezda ye.Peywira wê; hemû avên pak ji ewran dibarin bi şêweya rûbar,derya û zeryayan li ser erdê jiyanê bi hêz û domdar û paqij dikin, derûniya jin û mêran pak û temiz dike biparêze.Bi rêya pesindana Anahîtayê ve jî rêz bi awayekî ji Ahûra Mezda tê kirin.Ne tenê Anahîta nêzî 30 yezd hene ku cur bi cur xwedî bi hêz in û jiyana cîhanê rêk û pêk dikin.

Dawîya dawî di çanda kurdan de giramiya baweriya Xwedaperstiyê û olê zêde ye.Ji jiyana rojane bigrin heta derûniya mirovan bandoreka mezin li ser mirovan dike.

Lewma dagirkeran bi rêya olê kurdan xapandine nêzî xwe kirine ,asimîle kirinHeta niha jî pirranî di gundan de bi vê bawerî,hiş û bîrê ve tevdigerin bi rêzgirtina xwezayê ve jiyana xwe didomînin.
Ji xwezayê bi têra xwe sûdê digrin.

## Mîrza Akar: “Welatê me Kurdistan li Rojhilata Navîn û Nêzîk de, cîyekî stratejîk cîh digire”



**Mîrza Akar**
**Endamê Navendî ya PAK**

**Me digel rêzdar Mîrza Akar li derheq piştgiriya dewletên biyanî li Kurd li Rojhilata Navîn e hevpeyvîn pêk anî û navbirî got: : “Welatê me Kurdistan li Rojhilata Navîn û Nêzîk de, cîyekî stratejîk cîh digire”**

**P : Rêzdar Mîrza Akar hûn rola partiyên Kurdî di navbera rikeberiyên Amerîka û Rûsyayê de li Rojhilata Navîn de çawa dinirxînin?**

**B**: Heger em bi giştî bifikirin, her dewletekî zilhêz (Amerîka, Rûsya, Brîtanya, Çîn, Fransa, Almanya û hwd.) li Rojhilata Navîn, li gor berjewendîyên xwe yên neteweyî, xwedî plan û projeyên stratejîk in.

Welatê me Kurdistan li Rojhilata Navîn û Nêzîk de, cîyekî stratejîk cîh digire. Hîn bi peymana Sykes-Picot ku 1916an de ku di navbera Înglîstan û Fransa de û bi pejirandina Rûsyayê hat îmzekirin, erdê Împaratoriya Osmaniyan di navbera xwe de perçe dikirin. Lê piştî Şoreşa Oktober ya Rûsyayê, hukumeta Şoreşê plana Sykes-Picot ku bi dizî bû, eşkere kirin û ew xwe ji wê peymanê vekişandin. Piştî şerê Yekem yê Dunyayê, Îngilîstan û Fransa bi dewleta nû ya Tirk ku serkêşiya wî Kemal Ataturk dikir, Kurdistanê di navbera xwe de fermî perçe kirin. Bi Peymana Lozanê ku çend mehên din wê sed salê xwe dabigre, perçê mezin ji Tirkiyê re ma, perçeyek bi mandata Irakê ve ji Îngilîstanê re û perçeyek jî bi mandata Suriyê ji Fransayê re ma. Jixwe perçeyek di bin destê Îranê de bû.

Piştî vê peymanê Kurdstan bû koloniyekî navneteweyî û qedera Kurdistanê ket destê zilhêzan. Kurdistan bû berikek lîstika wan. Şerê duyem yê dunyayê de Rojhilatê Kurdistanê bû platformeke rikberiya Îngilîstan û Rûsyayê.

Bi dehan sale ku pêşî Rûsya wek Pakta Varşova û Amerîka jî di NATO yê de li ser herêmê hukim dikirin. Îro jî, her dû welatên zilhêz li gor berjewendîyên xwe yên neteweyî bi plan û bernameyên stratejîk hukmê xwe didomînin. Heger car caran têkiliyên wan li hin perçeyan, bi aliyên Kurdî re çêbûbin jî, herdem hevkarê dewletên ku Kurdistanê di navbera xwe de perçekirine re bûne.
Piştî şerê Duyem yê Dunyayê, Dewletên Yekbûyî yê Amerîka derket pêş. Heta Yekîtiya Sovyetê têkçû, DYA û Yekîtiya Sovyetê Kurdistanê kirin qurbana balansa navbera xwe.

Îro jî, Kurdistan bi çar parçeyên xwe ve, ji bo birêvebirina bernameyên xwe, ji bo wan herdû welatan giring e. Helbet ev herdû welat jî, di danûstandinên xwe yên bi partîyên kurdî re jî li gor plan û projeyên berjewendîyên welatên xwe birêve dibin.
Li vir a giring hêza partîyên Kurdî ya di nav gel de, hêz û zanistên wê yên dîplomasî, zanînên wê yên dan û standinan , proje û planên partîyên Kurdî û ya herî giring, çi bide wana ku beramber wî çi bidest bixe, bû. Di vir de daxwaz gihîştina armancê ye. Ji bo wî jî, divê partîyên Kurdî di daxwazên xwe de zelal bin. Ji bo daxwazên xwe xwedîyê bername bin. Divê, partîyên Kurdî li gor berjwendîyên neteweyî rola xwe bileyîzin. Take rêya biserketina dîplomasî û danûstandinan ew e. Tê zanîn ku, di sîyaseta berjewendîyên welatan de, dostên her gav dost û dijminên her gav divmin tune ne. Li gor rewşê dijmin dikare bibe dost, dost jî bibe dijmin. Berjewendî li pêş hemû tiştî ye. Divê partîyên Kurdî jî bi wê saîkê tevbigerin..

**P: Rêzdar Mîrza Akar Rûsiya pêka hewce piştgiriya partiyên Kurdî Sûriyayê nake sebeb çiye?**

**B**: Hevkarîya Rûsya û Sûrîyê qedîm e. Em dikarin bêjin ev niv qirn e, ev peywendî heye. Pêşî bi Hafiz Esed re, piştî wê jî, bi kurê wî, Beşar Esed re ev peywendîyên di warê sîyasî, aborî û leşkerî de didome. Rûsya ji bo Sûrîyeyê girîng e, ji ber ku bi alîkarî û piştgiriya Rûsyayê, li piya ye. Sûrîye jî ji bo Rûsyayê girîng e, jiber ku him li Rojhilata Navîn û him jî li dor Behra Spî yekane dewlet e ku erdê xwe kendav xwe ji leşker, balefir û keştiyên Rûsyayê re vekiriye. Ne ji Suriyê be, tu welat cî nade keştiyên şer yên Rûsyayê. Pêşîya krîza sîyasî ya Sûrîyê tu daxwazekî tevgera kurd li Sûrîyê ya mafê statûyê (Xwe muxtarîyet, Fedreralî ya jî serxwebûnê) tune bû. Bitenê daxwaza mafên çandî hebûn. Piştê têkçûna sîyasî ya dewleta Sûrîyê, tevgera kurdî li gor derfetên nû, daxwazên xwe bilind kirin.

Rûsya berê jî û nuha jî piştgirîya daxwazên Kurdan nake, ji ber ku, Rûsya li gel parçebûna dewleta Sûrîyê nîne. Li gel ku ev 11 sal e dewleta Sûrîyê parçebûyî ye û gelek dest û hêzên navdewletî ketine nav û axa dewleta Sûrî parçe bûye, her herêmekê hêzek birêve dibe jî Rûsya her piştgirîya rejima Beşar Esed kiriye û nuha jî dike. Hewil dide carekî din di nav sînorê wê yê berê de, dewleta Sûrîyê yekpare bimîne.
Rûsya her riya Şamê nîşanî Rêvebiriya Xweser û herweha hêzên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê dide.

**P: Gelo siyasetên piştigîriya aliyên Komarîxwaz û Demokratxwaz yên Amerîkayê li derheq paşeroja Kurdan li Rojhilata Navîn de çawa dinirxînin?**

**B**: Di siyaseta hundirîn de ferqiyetên her du aliyan hene û berbiçav in. Di kar û barên derve de ferqiyetên navbera herdû alîyên (Komarîxwaz û Demokrasîxwaz) cûdahîyên nûansî hebin jî, ne mezin in. Amerîka îro li Rojhilata navîn e. Peywendî û stratejîyên wî hem bi dewletên herêmê re û hem jî bi muxalefetên wan re hene. Amerîka baş dizane ku gel û neteweyekî kurd heye, neheqîyekî dîrokî lê hatîye kirinê. Û kurd bi giştî wê neheqîyê qebûl nekirine, ji bo ji holê rakirina vê neheqîyê bi dehan sale têkoşane û niha jî têdikoşin. Amerîka li gor stratejîya xwe dema pêwist buye bi Kurdan re têkildar bûye. Ji ber Turkiye endamê NATO ye, tu car nexwestiye bi hêzên Bakûrê Kurdistanê re yekser têkildar bibe. Di dema Şah de meriv dikare ji bo Rojhilatê Kurdistanê re jî vê yekê bibêje. Heger pêwendiyê Amerîka bi Rêvebiriya Xweser û bi Herêma Kurdistanê re hebe, ji ber şerê bi ÎŞÎDê û dijberiya Esad Û Sadam çêbûye.
Hem Komarîxwaz û hem jî Demokrasîxwaz bi giştî Amerîka li gor berjewendîyên xwe yên neteweyî tevdigerin. Di şêweyên peywendîyên bi kurdan re, ferqên biçûk, di navbeyna herdû alîyên Amerîkî de hene.

**P: Gelo siyaseta Rûsyayê ya di derheq gelê Kurd de, piştî şerê Ukraynê, ber bi çi aliyekê ve diçe?**

**B**: Ku em li dîroka pêwendîyên di navbera Rûsya û Kurdan de binêrin, emê bibînin ku Rûsya tu carê li gel kurdan helwestekî baş negirtiye.
Me li jor qal kir, beriya Şoreşa Oktobrê, Rûsya bi planê hevkariya Sykos-Picot re bû ku Kurdistana di bin nîrê Osmaniyan de, di navbera xwe de perçe dikirin. Piştî Şoreşê, Lenîn piştgiriya dewleta Tirk ya Ataturk kiriye ku perçê mezin yê Kurdistanê îlhaq kiribû. Piştî

»»»Dom R:7

## Nerîna Lîderan




**“Mistefa Hicrî:”**

Rejîma Komara Îslamî ji aliyê bîrdozî ve hilweşiyaye û bi jidestdana hêzê re rûbirû ye.



**“Itamar Benguir”:**

Em ê teslîmî gefên Hemasê nebin.



**“Ned Price”:**

Niha armanca rêveberiya Biden parastina mafên gelê Îranê ye, ne peymana.



**“Elî Xaminey”:**

Jinên li gor qaîde serê xwe negrin nabe ku bi bêdîniyê bên tewankirin.

»»»Doma R:6

Şerê Duyem yê Dunyayê Rûs piştgirî dan Şah, pişta xwe dan Komara Mahabadê. Amerîka him dema Şoreşa Îlonê û him jî dema Şoreşa Gulanê piştgiriya Mele Mustafa Barzanî nekir. Bi kurtî em vî sedûbîst salên dawîyê bînin ber çav, emê bibînin ku Rûs ne dema Çar, ne dema Lenîn, Stalîn de û ne jî nuha tu car nebûne dostê Kurdan. Her tim piştgirîya dagirkerên Kurdistanê kirine. Heger Rûsya bixwaze dikare bi hêsanî Esat mecbûrî lihevkirinek bi Kurdan re bike. Nuha Rûsya li dû lihevhatina Erdogan û Esad e ku encamê wê ruxandina Rêvebiriya Xweser be.

Îro, ji ber şerê Ûkrayna ku Rûsya hem di warê aborî de û hem jî di warê siyasî de her çend qels ketîye jî, peywendî û danûstandinên wî bi dewletên dagirkerên Kurdistanê re zêdetir bûne.

Herçend li jor me behs kiribû ku, di prensîbên sîyaseta danûstandinan de, berjewendî li pêşe jî, niha tu çirûskekî ku di pêşerojê de pêngavekî erênî ya Rûsyayê li gel gelê kurdistanê naxûyê.

Di karûbarên we de serkeftina we dixwazim
Silav û rêz

**Mîrza Akar**
**Endamê Navendî ya Partîya Azadîya Kurdistanê-PAK**
**02.01,2023**

## Şoreşa Jina, ronesansek e li dijî çespandina hêz û serweriyê



**N: Selam Îsmaîlpûr**

Di ola Zerdeştiyê de her û her şîretên bona parastin û paqişîkirina xwezayê ya li cîhanê tê kirin.Her weha diyalekta xwezayê di her warî de bi hûrbinî tê ravekirin.

Bawermendên vê olê her roj sê caran ji bo afirandina cîhan û hemû qenciyên xwezayê destên xwe ber bi rojê ve bilind dikin bi şêweya perestî lawayên şêkirandina qenciyan ji afirêderê nemir,baş,pak û mezin Ahûra Mezda re dikin.Jê pê ve tê de her û her afirandin û taybetiyên wê, wekhevbûna her hebûn û zindiyan-ku xweza di hundurê xwe de cur bi cur hebûn û zindiyan dihewîne-tê behs kirin.Ji bo berdewamiya vê jiyanê ya di vê jîngeha hevpar de gelek caran hişyariyên xwezaparastinê li mirovan tê kirin.

Di van jêgiran de ji bo berdewamiya jiyana zindiyan giringîya parastinê ya xwezayê ku warê zindiyan e eşkere tê dîyar kirin.

“..Li gorî baweriyê jiyîn ne tenê ji bo ajal û mirovan e.Di heman demê de her hebûnên xwezayê wekî zindiyan nebin û nelivin jî di nav vê jiyînê de perçeyên wê ne,hebûna wan bi hev re girêdayî ye.Ji ber wê her keliyê bandoreka mezin û domdar li ser hev dikin.”

Bi sedema vê bandorê temamî hebûnên xwezayê zindî têne qebûl kirin;wek ronahî,riwek û giya,giyanewer,cure ajal,însan...Ev hemû zindî berhemên Xwedayê mezin ji Ahûra Mezda ne.Divê wek sûretên Ahûra Mezda bêne dîtin û ji wan re rêz bê girtin.Mixabin roja îroyîn hişmendiya xwezaparastinê hêj li seranserê cîhanê berbelaw nebûye.Hêj her dewlet her însan li ser vê mijarê ya û li ser xwezayê jiyaneka hevpar li hev ne kirine.

Hêj kêşeyên ji encama xerabkirina xwezayê çareser nekirine û hêj rê li ber xerabkirina wê nehatiye girtin. Hêj nikarin ji bo parastina wê biryareka hevpar bidin û niqaş tê kirin.

Lê belê, kêm û kêm çar hezar sal berê an nêzî çar salan ev bîr, hişmendî di nav kurdan û aryayiyan de belav bûye û bûye bingeha jiyana rojan e.Hemû zindî wekhev,wekî hev hatine dîtin.Bona berdewamiya wê û dayinîn wê di cîhanê de tenê û tenê jiyaneka hevpar hatiye pejirandin û jiyîn.

Divê ji îro şûn de jî bawerî li ser vê hişmendiyê bê ava kirin û xweza bê parastin tim û tim paqij bê hiştin.

Ji bilî van şîret û hişyariyan di Avestayê de çar hêmanên jiyanê yên bingehîn jî derbas dibin.

Ew hêman;gewher av,agir,ax,hewa ne.Bi gelek salan şûn de Demokrîtosê yûnanî jî girîngiyan wan derxistiye li pêş cîhanê.

Ew sifetên Xwedayê mezin ji aliyê yêzdanên çavdêr ve têne parastin.Anahîta yek ji wan yezdanan e û yezdê avê ye.Ew jî wekî yên din aferideya Ahûra Mezda ye.

Peywira wê; hemû avên pak ji ewran dibarin bi şêweya rûbar,derya û zeryayan li ser erdê jiyanê bi hêz û domdar û paqij dikin, derûniya jin û mêran pak û temiz dike biparêze.Bi rêya pesindana Anahîtayê ve jî rêz bi awayekî ji Ahûra Mezda tê kirin.Ne tenê Anahîta nêzî 30 yezd hene ku cur bi cur xwedî bi hêz in û jiyana cîhanê rêk û pêk dikin.

Dawîya dawî di çanda kurdan de giramiya baweriya Xwedaperstiyê û olê zêde ye.Ji jiyana rojane bigrin heta derûniya mirovan bandoreka mezin li ser mirovan dike.

Lewma, dagirkeran bi rêya olê kurdan xapandine nêzî xwe kirine ,asimîle kirinHeta niha jî pirranî di gundan de bi vê bawerî,hiş û bîrê ve tevdigerin bi rêzgirtina xwezayê ve jiyana xwe didomînin.
Ji xwezayê bi têra xwe sûdê digrin.

# Qebarê şikestina Kurdî



N: Sabri Rasoul

Gelek çavkaniyan nîşan didan ku piştî têkçûna barê aborî, dê rejîma Sûriyê di paşerojeke nêzîk de ber bi têkçûneke siyasî biçe, ev yek bû sedem ku hevalbendên rêjîma Sûriyê, Rûsiya û Îran bi cidî bifikirin ji bo dîtina çareseriyeke bilez ji rêjîma Sûriyê re.

Lîreya sûrî li hember diravên biyanî, wek dolar û euro bi awayekî kêmwêne ji nirxê xwe hate xwar, û ev yek nîşanek aşkere bû li ser bilindbûna asta wermandina darayî "Inflation" bi awayekî bêhempa her ji destpêka qeyrana Sûriyê ya berdewam ji sala (2011) ve.

Li vir em dikarin amaje bi hin hokaran bikin ku bûn sedem bo peydakirina seqayeke guncaw bo rizgarkirina rêjîmê ji hilweşînê, ku ev yek bo mana rêjîmê li ser desthilatê wekî derfetekê hatin:

- Şerê Rûsyayê li ser Ukraynayê, ku keşûhewayek siyasî û aborî bo nêzîkbûna Rûsya-Tirkiyê çêkir, û herwiha rola taybet ya Erdogan di navbera du aliyên dijber Rûsya û Rojava de, ku herî zêde sûdê ji her du aliyan wergirt di warê aborî û herwiha jî di warê siyasî de, û bikaranîna vê çendê bo pêkanîna projeya xwe di Bakurê Sûriyê de ya ku jêre bûye wekî kabûsekî.

- Şoreşa Cemawerî li Îranê, ku dê bibe egerê çengokirina baskên rêjîma Îranê û qutkirina destwerdanên wê di karûbarên welatên cîran de, û dê bandora wê kêm bike, û valahiyek dê peyda bibe, da ku piştre ji aliyê Tirkiyê ve were dagirtin, û qada Sûriyê yek ji wan qadên bazirganiyê ye bo avakirina hevalbendiyên nû di bin navê "dijberiya terorê" de, hevdem ku rejîmên van sê welatan li gor pîvanên yasayî û siyasî rêjîmên herî zêde terorîst têne pejirandin.


- Lawazbûna dengê Amerîka di pirsa Sûriyê de li vê dawiyê ku rola wê bi tinê maye li ser sepandina hin sizayan li ser rêjîmê wekî yasaya Qeyser, û herwiha serpirştiya Hevpeymaniya navdewletî ya li dijî DAIŞê.

- Palpiştiya Komên "Rikberiya Sûriyê" li ser helwêsta Tirkiyê yê necêgîr û ku Tirkiyê şoreşa Sûriyê û pirsa koçberan wekî karta "Joker" li hember dawazkariyên Ewropî derbarê rewşa navxweyî û pirsa kurdî bikar tîne, û gefan li Ewropa dixwe bi penaberên Sûriyê û ji aliyek din ve vê yekê bikar tîne bo berfirehkirina dagîkariya xwe di nav xaka Sûriyê de bi behaneya şerê li dijî terorê.

Civîna di navbera wezîrên berevanî û ewlekarî yên Sûriyê, Tirkiye û Rûsyayê de ya li ser daxwaz û keftelefta Tirkiyê, di serî de li dijî "Rêveberiya Xweser" e, ya ku ji aliyê PYD ve li bakurê rojhilatê Sûriyê li sala 2013an hatibû ragihandin, ku Tirkiyê dixwaze nîşaneyên nû li ser hebûna metirsiyeke mezin li ser hebûna PKK bide, û pêwîstiya kontrolkirina sînoran û metirsiyên ewlehiyê li ser Tirkiyê, ku ev yek ji projeyên Erdogan yên siyaseta wî ya derve ye bo bidestxistina hilbijartinên bê.

Ji aliyê xwe ve, rêjîma Sûriyê dixwaze xwe wekî serketî di şerê li dijî miletê xwe de nîşan bide, û amaje bi "keftelefta hin rêjîman dike ji bo dirustkirina pêwendiyan digel wê", û vegerandina navçeyên berfireh yên ne di bin desthilata wê de, ku serkeftina wê bi awayekî mezin girêdayî êş û azarên xelkê Sûriyê ye.

Herdu tîniyê dîtina hev in, her yek ji wan dixwaze xwe li ser qada xwe pêgeha xwe




bihêz bike, lewra herdu jî dixwazin HSD lawaz bikin.

Serokomarê Tirkiyê yê Esed bi "qatil" bi nav dikir niha nizanî kengî wî himbêz bike, bi armanca dûrxistina hêzên HSD 30 kîlometran ji sînorên xwe, ku bi vê yekê dê hejmongeriya Amerîka bi tinê li ser navçeyên "kêlgehên petrolê" bimîne.

Waliyê Şamê jî ketiye lez û bezê bo pêşwazîkirina dagîrker axa welatê xwe, û bi wî re serkeftina xwe li ser xelk û miletê xwe ragehîne.

Di vê hevkêşeyê de her sê alî heta asteke mezin digehêjin armancên xwe, ku serokê Sûriyê kontrola xwe li ser welatekê (dirav şikestî û milet mişext û derbider) xurt bike, û sînorên bakur bi garantiya Tirkiyê misoger bike, û tiştê ku Tirkiyê jî nikarîbû bi şerên leşkerî bidest bixe, bi hêsanî bidest xist, ku wê bikaribe êdî heta (30 kîlometran) derbasî nav xaka Sûriyê bibe), Rûsya ji têgihîştinê razî ye, ji ber ku li nik wê şerê li ser Ukraynayê giraniya xwe heye, hevdem ku naxwaze ti hevalbendên xwe jidest bide.

Kurd bi tinê qurbaniya vê Sînyaroyê ne, hevdem ku di gelek bûyerên dîrokî de bûne qurbanî, tişta ku îro bi serê me tê duh, par û pêrar bi serê me hatibû, ku têgihîştina Tirkî-Sûrî-Rûsya wekî Rêkeftina Cezayîrê û têkbirina xewna Kurdî ye, tevî ku "Rêveberiya Xweser" ya PYD wekî markayeke bazirganî li ser navê Kurdan hatiye tapukirin, lê PYD bi xwe ne nûnertiya îradeya Kurd dike û ne jî derbirînê ji mafên Kurdan dike, ji ber ku bi rêya aliyên derve li ser gelê Kurd hatiye ferzkirin, û derbirînê li gelê kurd nake ne li ser asta neteweyî û ne jî li ser asta nîştimanî, tevî qurbanîdana mezin ya gelê Kurd (zêdeyî 12 hezar şehîd û zêdetirî 25 hezar birîndar), lê çarenivîsa vê Rêveberiyê û xwîna hevqas şehîdan ber bayê diçe!.

Partiya ku kar û barên herêma kurdî "Rojava" ji Qendîlê birêve dibe, berî niha jî dûpişkê Şamê ve hatibû jehrdan, gava serokê wê li ser zexta Tirkiyê ji Şamê qewitand, ev jî tê wê wateyê ku her têgihîştina siyasî û nesiyasî bi desthilatdarê Şamê re bê wate ye, heger di destûra bingehîn de nayê nivîsandin û parastin.

Li vir, di demê niha de dîtina rêyeke aram gelekî zehmet e û bi baweriya min ew demê bi nakokiyan hatî derbaskirin bi dawî bûye û êdî ji kurdan re ti hêviyek nemaye ji bilî daqurtandina vê tehliyê, ev tehlî ya ku gelek caran me di dîrokê de daqurtandiye û bi sal û zemanan li hember derdeseriya wê me sebir kişandîye.

Kurd bi jidestdana firsendên zêrîn navdar in, çiqas di hunera leşkerî û wêrekiya xwe de serkeftî jî bin, lê serkeftinên wan yên leşkerî bêhûde diçin ji bê tifaqî û nebûna nêrîna siyasî, hebûna nakokî û berjewendiyên kesayetî û girêdana bi nehez û neyarên hebûna gelê Kurd, û dîrok bi Kurdan û bêyî Kurdan timam dibe.

# Li serûbena bûyera Hûyanê



N: Vênûs Fayîq
W: Hesen Mukerem



Li peyketina keiçka Hûyanê, bazdana ser keçikekê li Sulêmaniyê û nerhetkirina du keçikan ji aliyê kurekî li bajarê Kerkûrê, Sê nûçeyên herî balkêş ên du rojên dawî yên sala 2022`an bûn ku, van her sê bûyeran, Nemaze bûyera Hûyanê, ji aliyê xelkê ve, li ser medyaya civakî komek pirsên zêde li ser hebûn ku ji wan:

- Karê keçikê li cihekê ku ji keçan re ne guncav e û tenê xortên"nexwendevan wir in" çi ye?

- Çima wan xortan wisa û bi şêwazê neşaristanî û hovane ber bûne canê vê keçikê?
- Çima civaka Kurdistanê roj li pey rojê ber bi paremaynê ve dimeşe?

- Çi kesek li hember bûyerên wiha de berpirsyare?

- Digel pirsyarên han de jî, hûrdekariyên pir zêde kevtin ber çav, ku her yek ji wan bi şêwazên xwe êrîş dikirin û aliyek tohmetbat dikirin.

Dibe ku aliyên Îslamî, partiyên desthilatdar, dezgehên ewlehî, malbat û sîstema perwerdehiyê be.

Hevalekî min got: "Ez ku xort im newêrim seredana cihên wiha bikim". Min jê pirs kir: Çima?

Di bersiva min de got: "Hemû gencên me nehatine perwerdekirin û nizimtirîn asta hişyariya civakî hene".

Îca karesateke mezin ku di welatekê de ku, desthilatdar îda`a pêşkevtin û demokrasiyê bikin, lê, asta perwerdehiyê bi berdewamî di asta kêmitirinê de be û tevgera hişyariyê her di asta xwarê de be.

Karesateke mezine ku di civakekê de festîvala Şaciwan û festîvala keçên model û konsertên stranbêjên biyanî birêve diçin, kiçî di cihek din de keç bi zileya lê bixin û weke qehbe binav bikin.

Karesateke mezine ku welatek berpirsên wê meht û pensa pêşkevtinê dikin û bajaran bi bajarên Dubayî û Parîsê dişbînin, kiçî di wan bûyeran de bilî ku baz didin ser keçikan û di cihek din de bi zile li mamoste dixin û li cihek din de keçike din bi zileyan lê dixin. Wira xemsariya desthilatê di vê yekê de dibînim ku piştî her yek ji wan bûyeran bilî ji bazdan û desteserkirina tohmetbaran, ti lêkolînêke micid a wisa encam nadin û ti stratîjiyeke perwerdehiya kêrhatî pêşnyar nakin bona pêşî girtin ji diyardeyên wiha.

Bûyerên han biqasî aloz û dijwar in ku niqaş li ser bê kirin çimkî ya ku, di kanalên medyayî de hatiye dîtin vê îhsasê dide te ku, civaka me gelek pêşkevtiye, kiçî hundr dibî, bi dehan nexweşiyên derûnî dest nîşan dikî. Herçend ku kanalên opozîsyûn civakê dikin bi hovîtiyekê ku ti dewseke çak bûnê tê de nine û ti pêşniyar û altirinatîf û rêçareyekê pêşkêş nakin. Kesên xwedî ramana olî jî, wê bi azadiya keçan ve girê didin û wan bi serberedeyî tohmetbar dikin.

Pirsa herî girîn ku gelek dubare dibû:

Çi kesek di vê derheqê de berpirsyar e. Min bixwe di posta xwe ya li barê vê bûyerê de desthilat bohmetbar kir, ku ev zêdeyî 30 salan e mejûlî berjewendiyên abûrî û madî yên xwe ne, ti kareke micid li ser bilind kirina asta hişyariya civakê encam nedan e.

Di vê navberê de xelkek zêde bi tohmetbarkirina mela û mêrên ayînî kabuleke din li Kurdistanê çavnhêr dikin.

Li ser hev ez ji hemûyan re dibêjim:

Di wan bûyeran de malbat, sîstema perwerdehiyê û sîstema îdarî her sê tohmetbarên sereke ne. Xemsariya malbat û seqet bûna sîstema perwerdehiyê di qonaxa bingehîn de digihîje bilindtirîn qonaxê, herwisa sîstema îdarî ku dezgeha hizbî û yên hikûmetî ku wan bi taybetmendiyan temisîl dikin, li derheq hişyarkirina civakê de û çakkirina sîstema perwerdehiyê, ti yek ji wan erkên rasteqîne yên xwe cî bi cî nekirine.

Ez behsa wê nakim ew cîhê ku keç li Hûyanê lê hatiye taqîbkirin û lêdan çiqas guncav e ku keçek wir bê dîtin an na?

Pirs li derheq tiştekê tirisnak de ye ku, ev jî, ev exlaqê herifî ya bikom a ku di wî cihî de ye, ku yek xort nayê dîtin cuda hizr bike, her weke ku di wêneyê de hat dîtin bikom keçik şopandine û bikom jî axavtinên xerab jê re gotine û bikom sivikatî pê tê kirin, eger ev yeka di vî welatî de bibe yasaya jiyanê, dibe xwazyê bû Kabolê bixwazin ku niha Taliban wir birêve dibe..

# Jin, Jiyan, Azadî

**N: Nîştiman Urmiye**
**W: Hesen Mukerem**

Di wan rojan de, silogana “Jin, Jiyan, Azadî” bûye kilîla şoreşa namumkin di Rojhilata Navîn a aloz de, di heqîqetê de jin “Ev koleya berê ya dîrokê” ye ku, bûye dujeh bo kevintirîn mêrsalariyê di Rojhilata Navîn de. Û bi peykera Şîetiya paşverû û siyasî ya ku jinê weke amûreke xizmetê ji armancên serdestî û hejimonyaya kapîtalîzmê de dibîne hejandiye, bi gotinek din di van rojan de geşbûna gelek planên lîstika kincan gihîştiye asta herî nizm û tepeserkirin û tundûtîjî jî dê di rûbirûbûna vê şoreşa jinê de pir bibandor nebe, ji ber ku herî zêde jin rastî zordestî û îstîsmarê hatiye.

Ku xwediyê zêdetirîn morala berxwedanî û hizra teslîm nebûn û ber bi pêşe çûnê ye, her ev teybetmendiyên han dîmenek taybet daye bi vê şoreşê û ev ji şoreşên din yên herêmê û heta di asta cîhanê de jî cuda kiriye. Her wekî ku şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî”yê pencereyeke ber bi azadbûn ji kategoriyên kirîzên aborî û pêkhatiya paşverû ya civakê û bindestiya çînayetî, û bi heman awayî jî vekirina pencereyekê ye bo afirandina tirsê ji kûrahiya sîstema axûndî de.

Loma, serkevtina hişmendiya “Jin, Jiyan, Azadî” tê wateya xêzkirina xeta pûçbûnê li ser hişmendiya civaka mêrsalariyê, civaka çînayetî û newekhevî, serkevtina hişmendiyê dibe sebeba şikestxwarina îdola pergala axûndan, bi bê vê ku armancê bipêke tevahiya armancên wê di halê jinavçûnê ne, bi wateyek din di cerbandina xwandina çar dehkên serkutkarî de, niha ev bixwe dibe vê cerbandinê derbas bike, cerbandinek ku dê di her rewşê de rêjeya wê ya neyînî kêm bike û Ji ber cinayetên wan ên li dijî serhildana gel, ji bilî dorandinek giran tu çareyek nemaye.

Rola jinê di vê şoreşê de pir rengîn e û faşîzma zayendî a pêkhatî ji avakerên Îslam û mêrsalariya Şî`e, li dewra Îranê hatiye dorpêçkirin di halê berfirehbûn û teqînê ye, bi gotinek din rêya hişmendiya jinê li derdora Îranê de ber bi navendê, zêdetirîn rol lîstiye, wiha zincîrên vê şoreşê şiyana sekinandin û ji hev belavbûnê nine. Cewhera xwe naskirina jinê bo hemû qatên civakê berfreh bûye û hemû qat di halê vegeşîna jiyanek dubare ne.

Îmkan heye ku, encama vê şoreşê hinek dereng dest bikeve û demdirêj be, lê, tişta ku şiyana texmînkirinê ye, zincîrên wê ne ku ji qut nabin û şikestê jî naxwen, bi gotinek din hemû qatên civakê di bin bandora koalîteya şoreşa “Jîna”yê de cih girtine û pêkhatin û tevnvîsên qatên navbirî di paşerojeke ne pir dûr a civaka saxlem û dûr ji nesaxiyên bingehîn de, dê ji bo nifşên paşerojê weke mîratekê be.

Û ev yek ji taybetmendiyên bingehîn yên vê şoreşê ne ku, laş û rihê nesax yê vê rejîmê hejandiye, hema hema di tevahiya kategoriyên bingehîn, ji aborî heta kategoriyên hûr di halê hilweşînê de ne û îmkanek zêde heye ku di paşerojeke ne pir dûr de li hember rewşa heyî de biçok bê, û xwar be, serî bitewîne û ber bi stûna îdamê ve here, ev gotin ji vejîna bê westiyan a jin û dayîkan di vê xakê de hatine û dibin nemir.

## Navenda Hevkarî: Em teqekirin ji xwenîşanderên Ciwanroyê şermezar dikin

Navneda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê li derheq xwenîşandan li Ciwanroyê û serkutkirina wan ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve daxuyaniyek belav kir û serkutkirina xwenîşanderan şermezar kir.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Roja Şemî 10ê Befranbarê di nav xwenîşandanên bajarê Ciwanroyê de ciwanekî temen 22 salî yê bi navê Burhan Eliyasî bi guleyên hêzên serkutkar ên rejîmê hate şehîdkirin û zêdetir ji 10 xwenîşanderên din jî birîndar bûn û hejmareke zêde jî hatine girtin.

Di demekê de ku zêdetir ji sê mehan e li Kurdistan û Îranê şoreşa “Jin, Jiyan, Azadî” berdewam e, hêzên serkutkar ên Komara Îslamî bi taybetî li Kurdistanê bi awayekî bê rehmane xwenîşanderan didine ber gulleyan û xwîna wan dirijînin.

Em wek Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistana Îranê, tevî şermezarkirina serkuta xwînayî ya xwenîşanderên Ciwanroyê, em sersaxiyê dibêjine malbata şehîd Burhan Eliyasî û xelkê berxwedêr ên bajarê Ciwanroyê û hêviya başbûna bilez a birîndaran dixwazin.

Em daxwazê li civaka navdewletî û aliyên siyasî yên Kurdistan û Îranê dikin ku li hember van tawanên rejîmê bêdeng nemînin û piştevaniya xwe ji xelkê serhildêr ên Îran û Kurdistanê re ragihînin.

Jin, Jiyan, Azadî

ناوەندی هاوکاریی حیزبەکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران

Biherife Komara Îslamî ya Îranê

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Kurdpa: Di berdewamiya serhildana seranserî de 121 welatiyên Kurd canê xwe ji dest dane

Pêka lêkolîn û zaniyariyên gihîştinî bi Kurpayê, ji dema destpêkirina serhildana seranserî li dijî Komara Îslamiya Îranê û piştî kuştina hikûmetî ya "Jîna Emînî"yê û doma serhildana seranserî, di heyama 106 rojên derbasbûyî de bi tenê li Rojhilatê Kurdistanê, 121 kes ji aliyê hêzên serkutker ên Komara Îslamiya Îranê ve hatine kuştin.

Ew amare, amara heta 11ê Befranbarê li xwe digire ku ji aliyê "Kurdpa"yê ve hatiye komkirin. Di vê derheqê de çendîn zaniyarî bi "Kurdpa"yê re gîhîştine ku lipeyketin û lêkolîn ji serastbûna û rastiya wan li ji aliyê Kurdpayê ve didome.

Pêka wan amaran:

Di hema 106 rojan 121 kesan canê xwe ji dest dane

12 kes ji wan canjidestdayiyan, temenê wan kêmtir ji 18 salan bûye

5 kes ji wan canjidestdayiyan, jin bûne

Di vê amarê de, "Nesrîn Qadirî, Sarîna Sa`idî, Hemîd Gulî, Omîd Husênî, Saman Rehmanî û Elîriza Kerîmî" bi sedema lêdana batoman ji aliyê hêzên serkutker ve canê xwe ji dest dane.

"Ramîn fatihî, Îsmaîl Dizwar, Hêmin Aman, Şadiman Ehmedî, Mihemed Hacî Resûlpûr û Şehriyar Adilî" piştî binçavkirinê di cihên nexuya de bi sedema îşkenceyan canê xwe ji dest dane, gotinî ye ku "Nesrîn Qadirî û Mihemed Lutfullahî" di dema binçavkirinê de hatine kuştin.

Piraniya wan welatiyan bi gulleyên şer hatine kuştin; Hatiye zanîn ku "Komar Derwîşî, Mo`imin Zendkerîmî û Rêbaz Salihîwend" jî bi gulleyên saçmeyî hatine kuştin.

30`ê xermananê, bi 14 canjidestdayan, rojên 4 û 5`ê Xezelwerê bi 12 canjidestdan û 24 û 30`ê Xezelwerê bi 44 canjidestdanan, ji wan rojane ne ku zêdetirîn rêjeya qetla hikûmetî tê de qewimîne.

Amara canjidestdayan li parêzgehên Kurdistanê:

Parêzgeha Sine: 40 kes (Sine 19, Dîwandere 5, Dêwlan 3, Seqiz 5, Kamêran 3, Merîwan 2 û Bane 3)

Parêzgeha Urmiye: 49 kes(Urmiye 4, Pîranşar 7, Şino 4, Bokan 18, Mihabad 14, Serdeşt 1 û Tîkab 1)

Parêzgeha Kirmaşan: 29 kes(Ciwanro 8, Kirmaşan 6, Qesra Şîrîn 3, Şabad 3, Selasa Bawecanî 1, Giyelan 1, Serpila Zehaw 1, Kengawer 2, Sehne 1 û 3 welatiyên xelkê Sunqurê li Kerec, Qerçek û Qezwîn)ê canê xwe ji dest dane

Parêzgeha Îlam: 1 kes

Xurasan: 1 kes(Qûçan)

Welatiyekî xelkê Başûrê Kurdistanê jî di rêûresma bi axsipartina yek ji canjidestdayiyên bajarê Baneyê de bi destê hêzên serkutker ên hikûmetê, canê xwe ji dest da..

## Mojgan Kawûsî bi danîna barimteya sê miliyard Tumenî hate berdan

Roja Sêşemî sê Befranbara 1401an a Rojî, Mojgan Kawûsî, çalakvana mafê ziman û etnîkî ya xelka bajarê Kelardeşta Mazenderanê piştî derbaskirina 104 roj girtîgeha demkî bi danîna barimteya 3 miliyard Tumenî ji girtîgeha Qaimşehirê hate berdan.

Mojgan Kawûsî ji aliyê taya 1 a Dadgeha Înqilab a bajarê Sarî bi tohmeta "kombûn û nearamî li dijî ewlehiya netewî" bi 39 meh girtîgeh û bi tohmeta "bêrêzî bi rêberî" û "çalakiyên propagandeyî li dijî nizamê" bi 15 meh û rojek girtîgehê hatibû cezadan û ji tohmeta "êfsad fî erz"ê bêtawan hatibû nasandin.

Mojgan Kawûsî berê jî bi girtîgehê hatiye cezadan û navbirî heta niha çendîn caran hatiye dadgehîkirin û tohmetên cuda bi ser de hatine sepandin.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (437)

## Wêneyên berxwedaniya Şoreşa Jinê li Rojhilatê Kurdistan û Îran

